

Bandora Hûnera Dengbêjiyê Di Avabûna Nasnameya Netewî Da

Mehmet Gültekin

Ekola dengbêjiyê beşeke sereke a zargotina Kurdî ye û ew gelekî bi dîrok û çanda civak, welat û serpêhatiyên mirovên Kurd va girêdayî ye. Ji hin mînakên ji dema Medan û Karduxan diyar dibe ku bingeha vê hunerê digihêje kûraniya dîroka kevnare. Moses von Choren di pirtûka ya ji sedsala 5an qala dengbêjekî bi navê Angares ê qiralê Medan Astyages dike, Ksenefon di pirtûka ya Anabasis de balê dikişîne ser strangotina Karduxên ku li pey wan ketibûn, her weha di dema Bîzansîyan de jî welatê Kurdan wek 'welatê dengbêjên kor' hatiye binavkirin. Bi taybetî jî ji qûrna navîn pêva nimûneyên derbarê van hûnermendên ku destan diafirandin her diçe zêde dibin û ronahî dibînin. Hûnera dengbêjiyê heta beriya sed salan li seranserê Kurdistanê belavbûyî bû. Ji qesran heta gund û eşîrên çoçer hozanên gelek bi navûdeng û xwedî repertûarên berfireh hebûn ku wan bûyerên dîrokî û evînî bi kilam û destanên epîk disêwirandin. Ji van hozanan ra roavayî bi gelemperî *Barde* dibêjin ku Kurd jî wan wek *Dengbêj* binav dikin. Weke mînak em ji hin berevokên zanyarên ji Rajava têdigihêjin ku dengbêjên herêmên cuda yên kurmançaxêf her wisa yên soranîaxêf jî hûnera xwe weke tehrê dengbêjên Serhedê pêşkêş dikirin, li gel kilam û heyranokan di repertûera wan de jî kilam û destanên epîk cihêkî sereke digirtin. Li gor çavkaniyên dîrokî û ji dengbêjên Serhedê ên sedsala 20an em dizanin ku wan dema strandinê de amûrên muzîkê bikarnedînin. Lê piştî di hin herêman de tê de guhertin çêbûn, weke mînak li Kafkasya Başûr, Rojava û Behdînanê dengbêjên vê ekolê destpêkîrin berhemên xwe bi hogiriya amûrên muzîkê pêşkêş kirin.

Ciwanên dengxweş di dibistanên dengbêjîyê de li bal dengbêkî fêrî vê hûnerê dibûn. Bikaranîna deng û ziman bi hostadiyeke muzîkal, teknîka nefesê û axaftinê, zanyariyên dîrokî ên malbat û eşîran, lêkolîna qewimadinan, çêkirina kilaman, ev hemû mijarên perwerdeya dengbêjan bûn. Bazil Nikitin di berhema xwe ya derbarê Kurdan da behsa van dibistanan dike, dengbêjên ku ez bi wan ra axîfîbûm jî ev yek piştrast kirin û salixê hebûna van dibistanan di dema pêşiyên wan de dan.

Şerefxan Bidlîsî di gelek beşên kifîba xwe da pesnê dengbêj, sazband , meqam û dengên Kurdan ên taybet dide. Lê di rastiyê da vedîtîna û şiroveya hûnera wan di sedsala 19an da ji aliyê rêwî û pisporên Rojvayî va pêkhat, Kurdan bi xwe jî 100 sal piştî wan dest bi berhevkirin û şirovekirina kilam û destanên dengbêjan kirin.

Di salên 1830 an da F. Dubois De Montpereux ê ku ji bo lêkolînan diçe Kafkasya başûr, berhevdaneke mûzîk û kilamên gelên wê herêmê dike. Piştî ku ew li Qulpê guhdariya kilamên Kurdî jî dike, van tespîtên xwe ên jêrîn dinivîse:

“Ya rastî di mûzîkên Faris, Tirk û Gurciyan da ahenga hewcedar tune ye. Stranbêj ji nişkêva ji qewarekê(pîw) banzdide yeka din, ji ber xê û ji ber naxmeyên bi nalîn dengê tabûî bêrîtîm dibe. Lê kilameka Farisî a bi melodyek giran û ciddî ku bi awazeke bengî hat pêşkêş kirin, zêdetir bi me xweş hat. Ji aliyê qarakterê xwe da ferqa kilamên Tirkî jî ji yên Farisan nîne. Yê Gurciyan jî wisa ye, jixwe wek diyar e, ew jî bi piranî teqlîtê cîranên xwe dikin. Lê belê dema ku kilamên Kurdî û ên kafkasî hatin stiran, me xwe di asteka din da hîs kir. Ezê wê bandora ku kilamên Kurdî di dilê min da peyda kirin heta dawîya emrê xwe ticar ji bîr nekim. Di kilamên Kurdî da serdestiya rîtîm û ahengê hebû, pêra jî awazê wan hinekî ciddî û bi bengî bû. Ya rastî min qet bawer nekiribû ku ji dilê Kurdekî ev tonên wiha derkevin.”¹

Dengbêjan di hemû qadên civakê da cih digirtin, yên bijarte di dîwanên mîran û hakimani li qesr û sereyan da. Bi vî awayî dengbêj di civaka Kurd da li gel mîr û oldar yek ji sê kesayetiyan sereke bû. Wî jî weke wan bi rêya hunera xwe hîtabê civakê dikir, bi ser de bi Kurdiyeke dewlemend a edebî, dengêkî muzîkal û dîksiyoneke paqij. Ew di gotinên stranên xwe da azad bûn, dikaribûn di dîwana mîrekî da qal û pesnê mîr an jî qehremanekî din bidin, herêma wan, rêvebiriya wan, rabûn û runiştina wan şirove bikin. Vê yekê jî dest dida ku berhemên wan li gelek herêmên cuda ên Kurdistanê beklav bibin. Ji mînakên qedim divê em qala kilam û destanên êpîk wek Mîr Mihemedê Botî, Dewrêşê Evdî, Hamê Mûsikê, Siyabend û Xecê hwd. bikin ku her yek ji wan li herêmeke cuda peyda bûye, lê ji wan herêman gelek dûr li Serhedê û Kafkasya Başûr jî ji aliyê hemû dengbêjan di

1 August Haxthausen: Transkaukasien: Andeutungen über das Familien- und Gemeindeleben, 1856 r. 316-31

nav dîwan û civatan da dihatin stran. Ev azadiya di çarçova kilam û destanan da rê dide ku em di berhemên wan da hêmanên destpêkê yên aidiyetê tespît bikin.

Pêvajoya avabûna nasnameya netewî bi peydabûna hestên hevbeş destpêdike ku tê da li bal hin gelan destaneke sereke bûye yek ji bingehên herî girîng. Hin ji wan destanan, yên ku piştî weke destanên netewî hatine hesibandin, wek mînak li Rojava Niebelungenlied a Almanan, destana Roland a Fransizan û li Asyayê jî a bijarte destana Gesar Xan a Tîbetiyên e. Li bal Kurdan jî Memê û Zînê gihîştîye wê dereceya ku em tê da van hestên hevbeş dibînin. Çavkaniya hemû van berheman dengbêjên qedîm ên wan welatan in.

Gelek destanên epîk yên evînê û qehremaniya ji aliyê dengbêjên Kurd da hatine afirandin. Zêdebûna van destanan hin di sed sala 19an da bala gelek lêkolînerên ji Rojavayê kişandiye ser xwe. Moritz Wagnerî di salên 1842-45an da guhdariya dengbêjên Kurd ên herêmên cuda dike û ji berhemên wan hin nimûneyan dinivîse. Wagner Kurdan wek miletekî ku destanan afirandiye şirove dike û dibêje:

“Kevneşopiya dengbêjiyê di welatên şerqê da tenê li bal vî gelê ku li Şengal, çiyayên Kardukan û li Kafkasyayê di destan da çek û sîleh azadiya xwe diparêze da hîn heyê. Kevneşopiya destanên epîk li cem civatên wek Tirk, Ermenî, Gurcî û ên din ji zûda ye ku di avzêma rewşa wan a siyasî da windabûye. Li bal gelên Kazak û Ûkranyayê ên ku hatin bindest kirin jî ti eserek ji qabiliyeta wan a afirandina destanan nemaye. Di wergerên destanên epîk ên Kurdên Êzdî da hestên rehmdarî, hesret, xemgînî û şayîşkişandinê bi hevra tîn ziman.”²

Di nav destanên epîk ên kurdî da destana dengbêjî ya Memê û Zînê ji aliyê naveroka xwe va ya herî dewlemend û berfireh e û ji hemûyan din zêdetir belav bûye. Ew li hemû herêmên Kurdistanê û bi hemû zaravayan ji aliyê dengbêjan da hatiye pêşkêş kirin. Wê di nav civata Kurd da hestên hevbeş pêkanîye û bandoreke kûr li ser bîreweriya guhdarvanan da hiştîyê.

Destana epîk Mem û Zîn ji pêvajoyeke demdirej ra derbas bûye û bi nivîsandina wê ji aliyê Xanî da jî gihîştîye destaneke netewî a modern. Lê di vê nivîsê da mijara me Mem û Zîn a zargotinî ye ku bi navê Memê Alan jî navdar e.

Em warin ser wê pirsê ku gelo çima Mem û Zîn a zargotinî ji hemû destanên epîk ên kurdî zêdetir li hemû herêman û bi hemû zaravayan belav bûye û hestên mirovan nêzikî hevdu kirîye. Destan bi piranî li ser bingeha bûyereke gelek mezin ku li her derê welat tê bihîstin û meraqek zêde peyda dike an jî li dor bûyerên lehengekî avadibin. Di hin destanan da bi piranî bûyerek dibe bingeh, di hinekên da jî taybetiya leheng. Em ku li ser vê bingehê tevbigerin, tespîta me

2 Moritz Wagner: Reise nach Persien und dem Lande der Kurden, Laipzig 1852, r. 255-257

ya pêşîn ya di destpêka destana Memê û Zînê da ew e ku, ew bi şiroveya du bajaran û du mirovan, Zîn a ji Cizîrê û Mem ê li Mixrîbê/Mixûrzemînê destpêdike. Dengbêj Mixrîbê ji Cizîrê, Memê jî ji Zînê gewretir pêşkêş dike. Bi ser da Mem û Mixrîb zêdetir bala guhdarvanan dikişînin ser xwe, ji alîkî va jî ber ku Cizîr li guhdarvanan çî bi dîtin û çî jî bi bihîstin eyan e, lê Mixrîb jî aliyê çiqas kêm piraniyên guhdarvanan va nayê zanîn, efsanewî ye, meraqeke zêdetir peyda dike. Piştî ku Mem digihêje bajarê Cizîrê û di mala Tacdîn da bicîh dibe, niştecihên bajêr gelek meraqa wî dikin, mala Tacdîn jî wê pêva dibe zîyaretgeh û tije mêvan dibe. Ji ber hatina vî mêvanê ezîz Tacdîn bi çend rojan naçe dîwana mîrê Cizîrê. Mîr dişîne pey wî, dema Tacdîn tê, mîr pirs dike, gelo teybetiya mêvanê wî çî ye ku ew evqas roj in ku ji dînwanê dûr maye. Tacdîn dibêje, wekî mêvanê wî pir bi heybet e û ger ew beşdarî dîwana mîr bibe, mîr ê li ber wî rabe. Mîr dibêje ku ew heta niha li ber ti kesî ranebûye. Mem tê dîwanê, mîr jî şewqa wî û ji hijmeklarî jî kursîya xwe radişe ser pêyan, Tacdîn destmala xwe datîne ser kûrsîya mîr. Dema mîr dîsa rudinê, Tacdîn dibêje, mîrê min, te digot ez li ber kesî ranabim, va ye Mem hat tu li ber wî rabûyî, pê ra destmala xwe ya di bin mîr da dikişîne ku êdî li mîr eyan dibe, wekî ew bi rastî jî rabûye ser piyan. Ne tesadûf e ku di hin varyantan da Mem wek *Melîk* an jî *Sultanê Kurdan* tê nasandin. Bûyerên ku li dor Memê û Zînê li Cizîrê diqewimin û bi dawî dibin jî yên ku di destanên me yên cuda ên evîne da rûdidin ne gelek cudatir in. Ew dildar dixwazin bigihêjin hevdu, lê jî ber astengiyên ku derdikevin hember mirazê wan, di hêviya xwe da serfiraz nabin û ew di vê oxirê da dimirin. Bi kurtasî em dixwazin bibêjin ku, wek diyar e balkêşiya herî xurt bo vê destanê bi piranî li dor kesayetiya Memê kûr dibe. Belê, ev Mem kî ye ku ji rêyeke evqas dûr tê, meraqeke zêde di dilê bajariyên Cizîrê da peyda dike û bi ser da jî bi wan ra bi zimanê wan, ango bi Kurdî diaxife? Kilîta zêdetir belavbûyîna vê destanê jî bi baweriya min hema di vê pirsê da veşartîye. Gelo ew varyantên di destê me da rê didin ku em bikaribin bersiva vê pirsê bidin. Herçî navlêka Alan e ew di şaxên cûda bi fonetîkên jî hev cihê diyar dibe, belê, di hinekan da bi wî awayî hatiye û carina navê bavê wî wek Mîr Alan jî tê şirovekirin. Lê di gelek şaxan da jî *Memê kûrê Al Paşa* ye, di hindekên din da jî navê wî *Memê Ala* ye. Gelo *Alan* jî navê bav, malbat an jî eşîrê tê, an peyvên al û ala çî jî ber tewandina bo çêkirina kaffiyeyê û çî jî bi guhertinên di telefûzê da bi dem û dewranan pêkhatiyê, divê di lêkolîneke taybet de bê şirovekirin. Hasil *Al* û *Ala* tên wateya payebilind û gewre. Ji aliyê din da em dizanin ku di hin şaxên destanê ên ji Bakûr, Rojhilat û Rojavayê cîwarê bajarê Mixrîbê raste rast li Yemenê tê destnîşan kirin û Mem jî wek kûrê paşayê Yemenê nasandin.³

3 Albert Socin, *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder im Dialekte von Bothan*, St. Petersburg 1890, r. 76; Oskar Mann, *Kurdisch-persische Forschungen*, Berlin 1906 r. 24; Hugo Makas, *Kurdische Texte*, St. Petersburg 1897 r. 5-15

Bi ser da di varyantên herî berfireh ên li Serhedê da Mixrîb nêzikî Behra Ummanê ye.⁴

Gelek destanên milletên cûda ên ku gihîştine dereca destana netewî di eslê xwe de li ser bingeha şerê hukimdariyê avabûne, lê para evîniyê bi sal û zemanan tê da xurttir cih digire, ji ber ku dengêjen wan berheman baş dizanibûn ku her mirov bi şer ra rûbirû nabe, lê êşa evîniyê di dilê her kesî da peyda, ew hestek e gerdûni ye. Bi alîkariya wê destan dikare zêdetir belav bibe.

Malbata Eyûbiyan ku hin di sedsalên 10.-11.an da li Kafkasya Başûr wek hukimdar navdar bûn piştra koçberî Iraqê bû û di sala 1171 an da bi serweriya Selaheddeînê Eyûbî dewleta herî xurt a li Rojhilata Nêzik bi navê Eyûbiyan avaka kir. Welatên wek Iraq, Sûrî, Mîsir, Yemen û parek ji xaka Kurdistanê di bin hukmê wan da bû. Ev welat û herêmên cuda Yemen jî di nav da ji aliyê bira, birazî û xwerziyên Selaheddîn dihatin bi rêvebirin. Navê Eyûbiyan li bal hemû Kurdan eyan bû, bi vî navî dipesinûn û qedrê wan di nav gelên cînar da zêdetir bûbû. Piştî têkçûna vê dewletê û êrişên dijberan li ser malbata Eyûbiyan hindêk endamên malbatê jî berê xwe dan herêmên cuda ên li Kurdistanê. Çewa di Şerefîyê da jî hatiye salixadayîn di navbera hin endamên malbata Eyûbiyan û desthilatdarên wê demê tekoşîna bidestxistina hukimdariya li hin mîrekiyan da qewimiye, wek mînak ew di ya Hesnkêfê da serfiraz bûne û ji wê pêva bi navlêka Melîk an jî Siltan tevgeriyane.

Dema mirov dibîne ku di sedsalên 12-13an de malbata Eyûbiyan di nav Kurdistan da ya herî navdar û naskirî bû û hin lêkolîner jî peydabûna destana Memê û Zînê dispêrin dora wan sedsalan, wê demê ne dûr e ku têkiliya destanê bi tekoşîneke desthilatdariyê a di navbera endamekî ji malbata Eyûbiyan û mîrê Cizîrê da qewimibe ku tê da Mem û alîgirên wî têkçûbûn. Mela Mehmûd Bazîdî di sala 1857an kurtasiya Mem û Zînê wek nesir amade kiribû. Di dawiya wê da Mela Mehmûd Bazîdî dibêje ku 'ev hikyat beriya nêzikî 800 salan qewimiye' ku ev jî rastî heyama Eyûbiyan tê.⁵

Di gelek kilamên evîni da jî em rastî hêmanên nasnameyê tên. Yek ji wan destnîşankirina cîwaran e, a din jî destnîşankirina aidiyeta mirov û komên civakê di çarçova nasnameyê da ye. Di gelek kilaman de peyva welat bi wateya herêmekî an jî mîrekiyekî tê bikaranîn, wek welatê Serhedê, welatê Hekariya. Di hin kilaman de jî em têdigihêjin ku dengbêj pêre xwediyê wê hişmediyê ye ku, ev herêm û navçeyên di kilamên wan de tên ziman hemû bi hev re perçeyên xaka Kurdistanê nin. Ev yek carina di kilamên evîniyê de jî dîyar dibe:

4 Ömer Güneş&Ibrahim Şahin, Antolojiya Dengbêjan, Dengbêj Reso, Stenbol 2018, r. 269

5 Mela Mehmud Bazîdî, Mem û Zîn, Stenbol 2007, r. 45

*“Delaliyê, Îran e xweş Îran e
Ji kirrê Girîdaxê bigire heta Kermanşahê pêda pêda Kurdistan e”⁶*

an jî

*“Lo-lo Baro, minê digo tê sibengê li daye tavîke berfê baranê
Nibê birevîne bavê mala Evdal begê Mîrze axa,
de wekî me xilas dike bila xilas bike, me xilas
neke, dîsa tê sibê me bavê nava komê lê-lê Kurdistanê.”⁷*

Em di destaneke epîk a gelek balkêş Kela Dimdimê da jî eşkere hêmanên nasnameyê dibînin. Ev destan li ser bingeha bûyereke dîrokî ji aliyê dengbêjan va hatiye afirandin ya ku di salên 1609/10an da qewimîye. Ev keleha li Rojhilatê li herêma Biradostan li ser çiyayê bi heman navî ye, mîrê wê Emîrxanê Lepzêrîn e. Di navbera wî û Şah Ebbasê Ecem da şer derdikeve û keleha wî tê dorpêç kirin. Piştî têkçûna Dimdimê leşkerên Şah di herêmê da komkujiyek qewimandine. Di hemû şaxên vê destana epîk a dengbêjan da Emîrxan wek Mîrê Kurdan tê nasandin. Ev destan jî di piraniya herêmên Kurdistanê de belavbûyî ye.

Di salên 1780an da li ser xaka Rojavaya îroyîn da gelek şer di navbera eşîrên Kurdan bi rêberiya Zor Temir Paşayê Millî dijî eşîrên dagirker yên Ereb da diqewimîn. Dengbêjên ku derbarê van bûyeran da destanên bi navê Derwêşê Evdî afirandibûn hema di destpêka wan da nasnameya wan terefên şer diyar dikirin:

*“Bavê Dewrêş Evdî bû
Dewrêş hê tinebû
Evdî şivanê Zor Temir paşayê Milî bû
Kîkan û Milan Kurd bûn, Gêsa Ereb bûn.”⁸*

Bûyerên şer û lehengiya Dewrêş di destanê da bi zimanekî gelek bilind ê edebî tîn şirove kirin. Dema destgirtiya Derwêşê Evdî *Edûlê* a keça Têmir paşa salixê Derwêş dide, rewşa wî a civakî û aborî, ecibandina wî a ji aliyê gel tev hestên xwe ên bi evîni, hisret û dilkovanî jî bi hevra tîne ziman. Lehengê destanê Derwêş Kurdekî ji baweriya bi ser Êzdayetiye ye, wî tev birayê xwe Sadûn ji bo parastina civaka xwe li dijî êrîşkarên Ereb şer kiriye. Dengbêj dikeve kûraniya hunera xwe û bi nîrxên gerdûnî wek şewandina yekrûhiyeke netewî û hestên

6 Ji berhevoka min, her weha binh.: Dengbêj Zahiro di youtube da kilama „Îran e xweş Îran e“

7 Kilama Baro ji Radyoya Rewanê û ji dengê Yunus Agirî.

8 Ordixanê Celil û Celilê Celil, Zargotina Kurdan, Moskova 1978, r. 279

evîniyê tabûyên olî hildiweşîne û Derwêş dike lehemgekî ecibandî ê civaka Kurdî a ku ji gelek baweriyên cuda pêkdihat. Ew evîna wan di kûraniya dilê hemû guhdaran da bi cîh dike. Dengbêj, bona bi destxistina evîna Edûlê, riya evîna welat bo Derwêş destnîşan dike. Ew minetdariya civatê a bo Derwêş ji di evîna Edûlê da zexm dike.

Hemê Mûsikê û birayê wî Gelhê ji êla Beraziyan in, ew li herêma Sirûcê dimînin û di salên 1840an da navbera wan û artêşa Osmanî da gelek caran ser diqewimin, ji ber ku ew bacê nadin dewletê. Nav û dengê Hemê Mûsikê li hemû herêmên kurmançaxêf, ji Meleyê heta Serhedê û Kafkaya Başûr, ji deşta Sirûcê hetanî çiyayên Şengalê belav bûye. Derbarê hemû pevçûnên wan da dengbêjan gelek destan afirandine û em di wan da li hember Hemê Mûsikê serokerkanê artêşa Osmaniyan Reşîd Paşa ê bi qetliyamên xwe va navdar dibînin. Piştî têkçûna berxwedana wan Hemê di sala 1844an da tê darvekirin. Ev Reşîd Paşa di destana Şêx Mîrza ê Anqosî de ji aliyê dengbêjan da wek serokê artêşa Osmanî li Kurdistanê tê nasandin.⁹

Piştî dagirkirina Kela Bazîdê di nîvê sedsala 19an da ew herêm êdî ket bin destê artêşa Osmaniyan. Piştî şerê di navbera Osmaniyan û Rûsan di salên 1877-78an da serbazên Osmaniyan li herêmê Kurdên ku îtaetê dewletê nedikirin digrtin û sirgûnî raovjayê dikirin. Derbarê bûyerek wisa a ji wê heyamê dengbêjan him destaneke epîk bi navê *Elî Xarziya* û him ji gelek kilam bi navê *De Xalo* afirandine. Şaxek ji vê destanê ji aliyê Prof. O. Celîl û C. Celîl hatiye berhevkirin û yek ji alî min da hatibû berhevkirin û weşandin. Elî xarziyê Hemzo begê ye û ew li herêma Makoyê cîwar in. Leşgerên Osmanî Kurdan berhev dikin Elî ji di nav da û wan di kela Bazîdê da davêjin zindanê. Xalê wî Hemzo qasidekî dişîne Bazîdê û fêr dibe ku Elî Xarziya tev gelekên din li wir zindankirîye û ewê wan sewqî taşxana Eziromê bikin. Di vir da dengbêj bona pêkanîna hestên hevbeş ên aidiyetê ji zarê Elî Xarziya bo qasidê xalê xwe dibêje:

*“Go, here bêje Xalê minê Hemze Begê del û dîne
Ji boy Xwedê va bira xwe nexapîne
Madam ê ware min ji destê Bînbaşî derîne
Bira pênc roja bajo, ma pênc roj berê min
bide Ezurma rengîne
Em heftê yek girtîne
Di nav da ji gişta qamçiya li min dixîne
Dibê, Kurdo, ha yûrî, xalê te mêrekî çê ye,
bira ware te li Deveboyna Ezurmê vegeirîne.”*

9 Celîl 1978 r. 256

Hemzo ji Makoyê tivdîra xwe dike û tev şervanên xwe va bi rê dikeve ku Elî Xarziya rizgar bike. Ew xwe digihîne herêma Parsînê û li wir xarziyê xwe ji destê leşkeran xilas dike, hemû girtîyan jî pêra. Elî Xarziya li terkiya xalê xwe sîwar dibe û ew dikevin riya berbi Makoyê. Di rê da tèn gundê Çatê, dewletê jî gundên hawirdor agahdar kiriye ku rê nedin van sîwaran. Di gundê Çatê da mirovek rêgiriya wan dike, gulekê berdide û Elî Xarziya dikuje. Dengbêj ve tevgêrê weke îxanet dihesibînin û bi asteke bilind a edebî êşa wê di dilê guhdarvanan da kûr peyda dikin.

*"Gelî cimaetê, sibe bû, li gelîyê Çatê tav diziriqî
Serê xarziyê li ser çoka xalê dixeriqî
Elîyê Xarza go, xalo, dilê min kîne-kîne
Wexta tu hatî bihar bû, eva payîzd e,
dar lê dixê çiloyê xwe diweşîne
Ewî bezê min top ke, birîna min da dîne
Egalekî li birîna min bibe bîne
Xêra min jî te ra tunîne
Ji boy Xwedê be, tase av ji min ra bîne
Bira xarziyê te emrê Xwedê bi cî bîne
Tu jî here, bira hêsîrê te li Îranê bê xweyî nemîne."*¹⁰

Dîsa di gelek kilaman da em rastî van hişyardeyên dengbêjan li hember mîr û rêberên Kurdan tèn ên ku qîma xwe bi Romê anîne:

*"Mîro, te xebera min nekir, min go, meçe Rom Xayîn e
Te dixapîne
Roma virek e, şaltek e, te dixapîne"*¹¹

Dema Surmeli Mehmed Paşa ê Elaşgirî di sala 1865 an da bi daxwaza Osmaniyan ji Serhedê gelek şerkar berhev kiriye û çûye aliyê Adanayê bona şikestandina serhildana Xozandaxê, dengbêjê wî Evdalê Zeynikê weha gazin li wî kiriyê:

*"Aha nîne, aha neke
Hezar mêrî nebe li Xozandaxê winda neke
Perdê bûka li dar ve neke
Me li welatê Serhedê rûreş neke"*¹²

Her wisa di kilama Bavê Baram Begê da jî ev helwest eşkere diyar dibe:

10 Mehmet Gültekin, Zargotina Kurdên Serhedê, Stenbol 2013, r. 215-226

11 Gültekin 2013, r. 223, 270

12 Gültekin 2013, r. 179-180

*"Hewar ware meçe, Rom xayîne
Ewê te bihere sûra Dîyarbekirê bi ceyranê bişewitîne
Koşka belek heft qat e, mal da hêvîya kê dimîne."*¹³

Di kilam û destanên epîk ên dengbêjan da gelek bûyerên ji dîroka Kurdan, serhatiyên mêrxasên gel, hêviyên civakê, taybetiyên qerektera netewî û nîrxên Kurdan bi zarê helbestkî diyar dibin. Di van berheman da qedîmiya zargotina Kurdî û têkiliya wê a xurt bi dîroka Kurdî va baş diyar dibin. Gelek kilam û destanên epîk ên dengbêjên Kurdî di destê me da henin ku mijara wan qewimandinên dîrokî nin. Bi sedan kilam henin ku bûyerên ji dema afirandinên xwe neqil û şirove dikin ku em di dîroka nîvîskî da jî dikarin rastiya wan bişopînin.

Mînakên girêdayî mijara me di kilam û destanên dengbêjan ên sedsala 20an da gelek in û navdar in. Lê divê ev beş bibe babeta nivîseke mayîn. Lewma bi kurtasiya wê, di kilamên dengbêjan ên ji sedsala 20an da em rastî zêdetir hemanên nasnameya netewî tîn ku bandora serhildan û berxwedanên wê demê di wan da eşkere diyar dibin. Bi vî awayî gelek kilam li ser tevgerên Qoçgîrî, Simko Axa, Şêx Saîd, Şêx Mehmûd, Ararat, Zilan û Dêrsimê hatine afirandin. Wek mînak min tenê di derbarê berxwedana Araratê da dora 60 kilamên ji dengbêjên Serhedê berhev kirin. Li ser nêzikî hemû navên kesayetiyên ku di pirtûka Îhsan Nûrî Paşa da derbas dibin û bi ser da gelek navên lehengên ku tê da nehatine nivîsandin yek bi yek kilam ji aliyê dengbêjan da hatine afirandin: Weke mînak derbarê Biroyê Hesikê Têlî, Ferzende Beg, Xalis Beg Memo û Nadir Beg, Hisê Beko, Edoyê Ezîzî, Reşoyê Silo û Zeyno, Şêx Zahir û Hedê, Seyîdxan, Elîcan, Tefîq, Evdilhemîd û gelekên mayîn. Hemû jî ji aliyê dengbêjan da wek lehengên tekoşîna bo parastina nasnameya netewî tîn şirove kirin. Ev kilam û destan di avakirina çand û nasnameyêke netewî di nav civaka Kurdan da xwediyê roleke sereke nin.

Her çiqas kevneşopiya dengbêjiya qedîm wek qalibek klasîk êdî neyê icra kirinê jî, wê di dîroka avakirina çand û nasnameyêke netewî da cihekî sereke girt. Gelek hunermendên hemdemîn kilamên wan pêşkêş dikin. Bi ser da ew kilam di beşên wek Rok, Rep û Operayê da jî tîn ceribandin. Bi her awayî badora ekola dengbêjiyê li ser hunermendên ciwan hin jî gelek xurt e. Wek mînak dema di salên 2013-14an da hêzên DAIŞê êriş birin ser Şengal û Kobanî hûnermendên hemdemîn şopa dengbêjiya qedîm meşandin û di nava demeke kurt da dora 500 vîdeolîp li ser van herdu bûyeran weşandin.

Çavkanî:

- August Haxthausen: Transkaukasien: Andeutungen über das Familien- und Gemeindeleben 1856
- Moritz Wagner: Reise nach Persien und dem Lande der Kurden, Leipzig 1852
- Albert von Le Coq, Kurdische Texte 1903
- Oskar Mann, Kurdisch-Persische Forschungen, 1906
- Ordixanê Celil-Celîlê Celil, Zargotina Kurda I-II, Moskova 1978
- Anatê Kurdo, Mem û Zîn duwanzde Varyant, Stockholm 1996
- Şerefxan Bidlîsî, Şerefname, wergera M.E. Bozarslan, Istanbul 1971
- Mehmet Gültekin, Zargotina Kurdên Serhedê, Avesta Istanbul 2013
- Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Şırnak Üniversitesi Yayınları No: 23, Ekim 2019
- Ömer Güneş-Ibrahim Şahin, Antolojiya Dengbêjan: Reso Istanbul 2018
- Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler, Şırnak Üniversitesi Yayınları No: 23, Ekim 2019